RÊBAZA HUNDIRÎN YA

KOMELA KANIYA SIPÎ YA REWŞENBÎRÎ Û CIVAKÎ

DI DERBARÊ KOMELÊ DE:

Di sala 1993 an de çend rewşenbîrên Êzdiyan bi alîkariya hindek dilsoz û xêrxwazên vê Olê komîtek bi navê (komîta Kaniya Sipî ya rewşenbîrî û civakî) damezrandin, wê çaxê jî xebata van kesan li gorî karîn û derfetên berdest bûn; karên wana jî, di çarçewa xebatên Rewşenbîrî“ cîvakî“ û werzeşî de bûn.

Û ji ber tunebûna derfetên berfereh û azad, û zordarî û kotekiya netewî û civakî ku li gelê Kurd dihat û têt kirin bi gelemperî, û zordarî û kotekiya netewî, civakî û olî ku li Kurdên Êzdî dihata kirin bi tayîbet, û serdestî û desthiladariya rêcîma Baisa şofînî li ser seranserê hêlên jiyana miletên Sûriya yê, her weha koçberiya hindek endamên vê komîteyê ber bi Ewrupayê ve bi tayîbet Elmanya, êdî evan fakteran li hember eşkerebûn û bihêzbûna xebatên komîteyê û bi cîhatina armancên van rewşenbîran bûne asteng. Daku gihi?te wê radeyê ku xebatên komîteyê hêdî hêdî bi demê re hatine rawestandin.

Û piştî demeka dirêj li Elmaniyayê endamên vê komîteyê wisa hest kirin ku erkekî dîrokî dikeve ser milên wana; êdî piştî gelek hewldan, danûstandin û ferehcivînan dikarîbûn careke dinê û di bin wê sîwana merovanetî û Êzdiyatiyê de, dest bi xebata xwe bikin, û sûdê ji wan derfetên azad û demukrat yên ku li vî welatî hene wergirin; û hêjayê gotinê ye ku karê ku evan kesan di vê dema kurt de li vî welatî kirîn, ewan bawer ne dikirin ku di xewnên şevan de jî karekî wisa li welatê xwe karibin bi cî bînin.

Encama vê yekê jî di civînên eşkere de, xwedaneheva Êzdiyan li dora wan, danûstandinên eşkere û bê sînor di navbera komelên û saziyên Êzdiyan li Penaberiyê de hate xuyakirin.

Her weha civîna ku li 02.01.2004 an de ku li bajarê Bielefeld a Elmanî hate li darxistin yek ji hêjaancamên azadî û demukratiya vî welatî bû.

Di wê civînê de û piştî danûstandineke hûr û kûr hindek biryar hatin standin:

- Nivîsandina program û rêdaneke hundir ji bo Komelê.

2- Guhertina navê komîteyê ku „ Komela Kaniya Sipî ya rewşenbîrî û civakî „ kete şûnê.

3- Daku em karibin dengê xwe bigihînin hemî Êzdiyan û hemî hêzên xêrxwaz û aştîxwaz li cîhanê pêdivî bi damezirandina alavekî ragihandinê heye.

NAV Û BAREGEH:

Komela Kaniya Sipî ya rewşenbî û civakî.

Baregeh (navnîşana) Komelê li bajarê Biekefeld Herêma Nordrhein Westfalen e.

NASNAMEYA KOMELÊ:

Komeleka rewşenbîrî, civak û serbixwe ye, her Êzîdiyek ji kur be bila bibe dikare ciyê xwe têde bigre; eger ew para mezin ji program û rêdana wêna bipejirîne; komel ji bo bi cîanîna

armanc û xwestekên xwe di xizmeta civaka Êzdî bi tayîbet û merovanetiyê bi kelmperî li ser bingeheka demukrat, birayetî û rawergirtiyane karê xwe dike.

SIMBOLA KOMELÊ:

Afrandina Gerdûnê li cem Êzdiyan bi şêweyekî hunerî û sivik, ku bi pirtika Nîgarkêşekî Êzdî hatiya neqişandin.

ARMANCÊN KOMELÊ:

1. Kar ji bo anînecemhev, parastin û xizmeta Êzdîyatiyê; berevanî di ber wana de di hemî waran de li gorî karînên komelê; kar û hewildan ji bo rê li ber girtina ewan kiryarên nemerovan e yên ku li dijî Êzdiyan têne kirin, mîna derxistina Êzdiya bi darê zorê ji welatên wana, ku ji layê desthiladarên ewan welatên ku Êzdî têde dijîn ve tête bikaranîn.

2. Kar ji bo ku Êzdî di ewan welatên ku têde dijîn de, û mîna hemî Ayînên din bi azadî û bi zimanê ku ewna dixwazin seqa, girdiş, diwa û dirûzên xwe bikarbînin; her weha mafdan û serbestkirina vekirina dibistanên Olî ji bo xwendina ayînê Êzdî li ser bingehin birayetî û lêborînî; û ji kîsî ewan welatên ku Êzdî têde dijîn de, her weha serbestkirina li darxistina şahî û cejnên ayînî, û rojên cejnan bibin rojên veysandina fermî ji bo şagirt, xebatkarên sivîl û leşkerî,yên bawermendên vê ayînê, di hundirê welat de.

3. Kar ji bo yekgirtina peyva Êzdiyan, di riya bihêzkirin û nûjenkirina têkiliyan di navbera Êzdiyan xwe bi xwe de ji layekî ve, û ji layekî dîtir ve di navbera Êzdî û rêxistin, û aliyên olî û merovanetî di cîhanê de di riya danûstandin û rawergirtinê de, ji layekî dîtir ve; Kar ji bo ku Ola Êzdî ciyê xwe di rêza ayînên cîhanî de bigre.

4. Kar ji bo danehev, nivîsandin û nûjenkirina çand û keleporê vê Olê, ji bo parastina hîmên Olî, her weha afrandina lêkolînan di derbarê hemî hêlên Olî û jiyana xelkê vê Olê de, civakî, rewşenbîrî û dîrokî û wergerandina van berheman bo gelek zimanan, û belevkirina van berheman bi rengê pirtûk eger derfet hebin.

5. Nivîsandina lêkolîneke Ciyografî û dîrokî li ser Êzdiyan bi gştî û li ser Êzdiyên başûrê rojavayê kurdistanê bi tayîbetî ku bibe jêder û çavkaniyek, û damezirandina şaxan ji komelê re li ciyên ku Êzdî lê dijîn de.

6. bi hêzkirina rola jinê daku bikaribe ciyê xwe yê surîştyan e mîna Mêr di civatê de bigre, di riya pişkdariya wêna di hemî bizavên cor bi cor de mil bi mil li gel mêr. Her weha li xwedîderketina li biçûkan û perwerdekirina wana bi şêweyekî tenduristyane, li gor derfetên berdest. Vekirina hemî derfetên zanînwergirtinê li pêşiya gêncan, ji bo sînorkirina derketina ji rêza civatê.

7. Alîkariya xwendevan û ?agirtên Êzdiyan yên ku ji ber sedemên aborî nikarin xwendina xwe bi dawî bînin, her weha alîkariya malbatên Êzdiyan yên belengaz û li gor karînên komelê di dema nuha de .

8. Birêkûpêkirina komîteyekê ku bişêt bi Parêzerekî Elman re peywendiyê çêkê (an jî bêtir) ku ji Êzdîyatiyê bi tayîbetî û jî pirsên mafxwestin û mafwergirtina mafê penaberiyê bi kelemperî agahdar be; daku li nik dadgehên Elman dubarepirskirin û lênerîna pirsên ewan kesên Êzdî yên ku hîna mafê mana li vî welatî bi dest nexistine bikê.

KOMÎTEYÊN KOMELÊ:

1. KOMÎTEYA KARGÊR.

2. KOMITEYA RAGIHANDINÊ.

3. KONGREYA GI?TÎ.

1. KOMÎTEYA KARGÊR:

Ew komîteya bi revebir û bi cîanîna biryar û armancên Kongreyê ye di komelê de, endamên wêna di Kongreya salane de bi piraniya dengan têne hilbijartin, endamên wêna gerek ne kêmî çaran (4) bin û nê bêtir ji heftan (7) bin. Yê ku xwe ji bo endametiya evê komîteyê hilbijêrê gerek ji kêmanî sê meh di ser endametiya wîna re derbas bûbin.

Nuha bi vê rengê jêrîne:

a. Serok.

b. Cîgirê serok.

c. Berpirsiyarê Aborî.

ç. Nivîskar berpirsiyarê ragihandinê.

ERKÊN KOMÎTEYA KARGÊR:

A. Pi?tî kongreya giştî ev komîte di cî de civînekê ji bo hilbijartina berpirsiyarekî

(serokê komelê) û belavkirina karûbar li ser endaman tête li dardixîne.

B. Bi be?darbûna 51% ji andaman û serokê komelê an jî cîgirê wîna her meh an jî li gorî rewşê, komîte civînekê li dardixîne.

C. Tekûzkirin û rabûna bi karûbarên li darxistina kongir, bê guman bi beşdariya hemî endaman eger derfet hebe, û girêdana kongirekî awarte eger pêdivî pê hebe.

Ç. Guhartina serok an jî endamekî komîteyekê eger ew î endamî rêbaz û armancên komelê binpêkiribn.

D. Erêkirina li ser xwestekaran, di navbera du heftiyan tanî mehekê de.

2. KOMÎTEYA RAGIHANDINÊ:

Endamên wêna ne kêmî (3) kesan û ne bêtir ji (5) kesaye ku ew jî di kongreyê de piştî bi destxistina 51% ji dengan têne hilbijartin pêk têt, û gerek serokê evê komîteyê yek ji endamên komîteya kargêr e be,

Erkên wêna jî evin:

1. Birêvebirina karûbarên rewşenbîrî û rojnamegerî di komelê de.

2. Birêvebirineka giştî li ser derçûna belavok û hemî karên çapemenî di komelê de.

3. KONGREYA SALANE:

1. Kongreya salane ew desthilatdara herî mezin e, ji endamên komelê yên fermî pêk tê, Endamên rêzgirtinê û mêvan jî dikarin beşdarî Kongreya salane bibin, lê hilbijartin û dengdan ne ji mafê wana ye. Her weha dibe ku kongireyên awarte jî bêne girêdan, lê piştî erêkirina (25%) ji endamên komelê, bi şêweyekî nivîskî ku têde sedemên pêwîstiya lidarxistina Kongreyeke awarte bêne destnî?an kirin

2. Biryarên ku di Kongreyê de têne standin, gerek e para mezin ji dengan bistînin.

3. Kongreya salane dikare van biryaran bistîne:

A. Avakirina komîteyan ji bo bi cîanîna armancên komelê yên li jor destnîşan kirî, û çavdêriya kar û bizavên evan komîteyan ji layê komîteya kargêr ve tête kirin.

B. Hilbijartina komîteyeka kargêr a nuh.

C. Erêkirina aboriya (hatin û çûna aborî) a komelê ji bo sala nuh piştî wergirtina kargêriya komelê.

Ç. Tekûzkirina rêbaza hundir a komelê.

D. Hilanîna an jî mayîna komîteya kargêr û hemî komîteyên din, an jî guhartina hindek endamên wana, piştî xwendina raportan û erêkirina wana, û pêşkêşkirina raportekê li ser aboriya komelê.

4. ÇAVKANIYÊN MEWDANÎ YÊN KOMELÊ:

1. Aboneyên endaman yên heyvane (5) Euro bi awarteyî endamên ku li li rojhilatanavîn dimînin.

2. Alîkariyên serbest, û ne sînorkirî.

3. Qezencên ji bizav û berhemên komelê.

4. Alîkariya eşkere û zelal, ku ji aliyê kesayetî, dezgeh û saziyên dost heval tête pêşkêş kirin,

MERCÊN ENDAMETIYÊ:

Piştî peydabûn û bi cî anîna van merc û xalên jêrîn, her kesayet, komel, sazî û grûp dikarin mafên endametiya me wergirin:

1. Xudan/ê/a xwestekarê gerek Êzdî be.

2. Pêdivîya ku dozkerê xwestekarê 18 sal tije kiribin.

3. Gerek e ew merovekî nav û deng û sinc pak be.

4. Gerek e baweriya xwe bi armancên komelê bîne, û para bêtir ji Rêbaza hundir bi pejirîne.

5. Dayîna aboneyên mehane û salane.

6. Her weha Endametiyeka awarte (rêzgirtinê) Komel pêşkêşî Kesayetiyên ne Êzdî yên ku xebat û bizav di ber civata Êzdiyatyiê de kirine dike, û ew ji mercê (5) an azad in.

ERKÊN ENDAM:

1. Bawerî bi armancên Komelê û pejirandina para bêtir ji Rêbaza hundir û jidilhewildanên pêkanîna wana li gor derfetan.

2. Ew kar û kiryarên ku li dij armancên Komelê ne neke.

3. Rêzgirtina biryarên Komelê, û piştgirî û berevanî di ber de li her ciyekî.

MAFÊN ENDAM:

1. Di bawerî û nerînên xwe yên siyasî de azad e.

2. Beşdarbûna di civat û danûstandinên di derbara rewş û xebata Komelê de.

3. Parastin û berevaniya di ber Endaman de yek ji erkên Komelê ye, eger hat û ew ji aliyê ciyekî din ve tûjî hindek kiryarên nemerovane bû.

4. Her endamek maf heye bi şêweyekî azad nerînên xwe di derbarey xebatên Komelê û danûstandinên ku di wê rewşê de çêdibin bîne ziman.

5. Hilbijartin û dengdan mafê her Endamekî fermî ye.

MERCÊN KU ENDAM JI ENDAMETIYÊ TÊ AVÊTIN:

Her Endamek mafê xwe yê Endametiyê ji dest dixîne, eger wîna ev

mercên jêrîn derbas û binpêkirin:

1. Pêşkêşkirina destkêşaneka nivîskî ji kar. Dê komîteya kaegêr di navbera mehekê de biryarê li gorî rêzika 51% ji dengdanê bistîne.

2. Mirin, eger Endamekî Komelê koça xwe a dawî kir, mafê Endametiyê li ser tê hilanîn.

3. Eger Endamek du caran hate hayîkirin û yek ji mercên programê an jî ji yên rêdana hudir binpêkir, dê biryara kişandina mefê Endametiyê li gor rêzika 51% ji dengwergirtinê bê sitandin.

4. Eger karekî li dijî Rêdanên wî Welatê ku ew têde dijî kir, û bête gunehbarkirin, dê biryar piştî rawergirtina Pisporaên yasayî bête standin.

5. Eger yek bi nexweşîneke kûjer bikeve ku nikaribe bi erkên xwe bi wî rengê pêdivî rabe

(ji layê mejî ve).

NEMANA KOMELÊ:

1. Biryara rawesatana (nemane) Komelê ji aliyê 75% ji Endamên Komelê ve yên ku dengdan ji mafê waye tête sitandin.

2. piştî nemana Komelê hemî mal û mewdanê Komelê wekî Emanetekî li cem Belediya Bielefeld an jî ew bajarê ku Baregehê Komelê lêye tê hilanîn.

Têbînî: Mebest ji peyva endam di seranserê vê nivîsê de her du zayend in.

Û serkeftin tenê ji kenarê Yezdanê pakî dilovan têt.